

Xwedîkirina Pitikan û Zarokên Biçûk: Ji bo Alîkaran Xalên Girîng

Bînin Bîra Xwe:

Pitik û zarokên li jêrî 2 saliyê bi taybetî di rewşên lezgîn de hasas in.

Tiştên li malê di rêzê de ne – ji bo we û koçberan – dibe ku ewle nebin di rewşên hasas de. Hewl bidin ku tiştên şexsî li ser we bandorê nekin.

Mijandin di rewşên lezgîn û awarte de jiyane xelas dike. Divê dayîk bîna teşwîq kirin û piştgirî bê dayîn ku heta zarokên wan dibin 2 salî şîrê xwe bidinê.

Stres, bêtaqetî, nexweşî û bêavî şîrê dayîkê *NAçikîne*, lê dibe ku dayîk wisa HÎS bike. Dayîkan teşwîq bikin ku pitikê mijîne.

Eger dayîk pitikê bi rêya hem mijandinê hem jî mamayê xwedî bike ango di du heftiyên dawî de dest ji mijandinê kişabe divê bê teşwîq kirin ku vegere tenê mijandinê. Bila dayîk rojê 2-3 saetan pitikê bidanê ber bi singê xwe ve û PÎŞTÎ şîrê dayîkê mama bidê.

Pitikên li jêrî 6 mehan hewceyî şîrê dayîkê ango şîrê mama ne.

Pitikên li jorî 6 mehan (eger neyê mijandin) dikarin bi şîrê ajalên (bizin an jî çêlek) û xwarinên din bîna xwedî kirin. Ne hewceyî mamayên din e.

Amadekirina Mamayê Pitikan:

Mamayê ku amade ya herî ewle ye. Mamayê bi toz ne paqij e, dibe ku ew hatibe pîs kirin û hewceyî zêde haziriyê ye.

Li ser şûşeyan pir mîkrop hene. Tas baştir e ji bo paqijkirinê ango tasên yek sefer bigrin. hemû pitik dikarin bi tasan bîna xwedî kirin.

hemû amûr divê baş bîna temîz(paqij) kirin.

Şûşe û tasan bi avekî germ bîson bera tîna paqij kirin.

Divê toza mama bi avekî 70 derece bê kelandin da ku wan baqteriyên di nav avê ango tozê de bîna kuştin.

Divê mama berê neyê amade kirin. Eger tu çareyên dî tune be bera ku ew bîna bikaranîn bidanêne di sarincê de. Paşê bo herî zêde 4 saetan hûn dikarin bigirin li gel cemedê ango bo herî zêde 3 saetan di çanteyê xwe de.

Eger we hewce zêdetir agahiyan be herin wê sîte: www.enonline.net/guidelinesiycfeedingsupporttransit